8- Damezrandina fermandariyeke leşkerî ku hemû hêzên Kurdî li xwe bigire, da ku ji nû ve ew hêz bêne birêkxistin.

9- Karkirina li ser peydakirina pêdiviyên jiyana welatiyan û lipêşxistina dezgehên xizmetguzarî.

10- Sûdgirtina ji guhertin û bûyerên ku li Rojhilata Navîn rûdidin .

Û divê em bizanin ku Rojavayê Kurdistanê girîngiyeke wê ya aborî, ciyografî û siyasî heye û hemû dijminên Kurdan hewl didin ku tevahiya destkeftiyên Kurdan têk bibin; îcar aliyekî Kurdî bi tena serê xwe nikare keştiya Kurdan bi aramî ji nava firtoneya Sûryayê rizgar bike...

Lewra pîwîst e Kurd mafên xwe yên destûrî misoger bikin, berî ku hêzên Amerîkî ji Sûryayê vekêşin û rêjîm êrîşî Rojavayê Kurdistanê bike.

Ji ber ku hevsengiya hêzan, qet ne di berjewendiya Kurdan de ye.

Helbestvanê Navdar Dildarê Mîdî: “Qamişlo pêsîrên dêya min e. Nizanim ez ê sax lê vegerim, ne jî di pêçekeke ji pêçeka zaroktiyê biçûktir de lê vegerim.”

Ew Mihemdê Ehmedê Hacoyê Doşo ye. Bi nasnavê Dildarê Mîdî tê naskirin. Bavê wî ji gundê Bafê yê Bakurê Kurdistanê, koçî Rojavayê Kurdistanê kiriye û piştî rûniştina li çend gundan, êdî li gundê Elwanka Şêx bi cih bûye.
Dildarê Mîdê di 1’ê Sibata 1963’yê de li gundê Elwankê çavên xwe li jiyanê vedike. Di malbateke cotyar û hejar de salên zaroktiyê dibihurîne.
Li gundê Elwankê hetanî refa 2’yê dixwîne, paşê di 1972’yê de bi malbatî diçe Qamişlo û her li wir dimîne.
Qonaxên xwendina seretayî û navîn li Qamişlo diqedîne, da ku paşê li Zanîngeha Şamê tevlî Fakulteya Wêjeya Erebî bibe. Bi qasî du salan Wêjeya Erebî dixwîne, lê ji ber rewşa aborî xwendina xwe nadomîne û êdî bi yek carê dest ji xwendinê berdide.
Çawa ku Dildarê Mîdî bîrewer dibe û dikeve nava firtoneka xwepirsînê da ku xwe binase, bi dest xwe re hestên neteweyî li nikê geş dibin û yekser şopa xwe destnîşan dike; ji ber ku ew di malbateke Kurdperwer û welatparêz de xwedî bûye û wekî ku diyar e, babeta Kurdperweriyê wekî heyvanekî zikmakî ye li balê.
Bi dehên salan di nava komên hunerî û folklorî de xebitiye.
Sê dîwanên wî yên helbestan bi navên: Kevana Reş, Ken û Girî û Ez û Jîn hene. Her wiha 2 destnivîsên wî ku danheva parçeyên folklorî ne, aniha ji bo çapê amade dibin.
Dildarê Mîdî bi qasî 8 caran hatiye xelatkirin; ne tenê wekî helbestvan, belê wekî mirovperwer jî hatiye xelatkirin.
Di dema dawî de penaberî Başûrê Kurdistanê bû û hetanî aniha hêj li wir e.
Di şopa têkoşîna neteweyî de, Dildarê Mîdî gelek şax û rêçan li pêş xwe vedike û di qadeke berfireh de, dîlana azadîxwaziyê digerîne.
Di vê hevpeyvîna jêrîn de, tenê rûpeleke biçûk ji xebata Dildarê Mîdî bixwînin.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

-Cenabê te hem bi xebatên daneheva parçeyên folklorî û zargotina Kurdî, hem jî bi helbestvaniyê tê nasîn.
Tişta ku te ber bi nivîskariyê ve kişand, helbest bû yan jî zargotin bû?
Min di dawiya 83’yê de ji hûnan û ristina helbestê dest pê kir.
Di ber re jî min li ser folklora Kurdî lêkolîn dikir, bi taybet min gelek pirs ji bavê xwe dikirin.
Her çi qas bavê min nexwenda bû jî, lê te digot qey zimanzan e. Di biwara folklora Kurdî de pir têr û dagirtî bû.
Îcar pir tiştên xweş ên wekî: metelok, mamik, sitranên şeran, çîrok û çîvanokan...min ji bavê xwe girtin.
Aniha wekî du destnivîsên min di vî barî de hene. Min gelek gotinên pêşiyan jî dabûn hev, lê di şeva daweta min de winda bûn..

Ez venaşêrim. Yekem helbest min ji evîndara xwe re nivîsî.

-Te yekem helbesta xwe ji bo çi, yan jî ji kê re hûna?
Ez venaşêrim. Yekem helbest min ji evîndara xwe re nivîsî.
Evîndara ku min 12 salan jê hez kir, bû hevjîna min û aniha dêya zarokên min e. Em hîn jî ji hev hez dikin.
Ji aliyê din ve, belku endamên malbata min ne partîzan bûn, lê malbateke şeydayê Kurdewariyê bû.
Malbata min malbateke civakhez bû û gelek mirovên welatparêz li me dibûn mêvan.
Min êş û jan, komkujî, perîşanî, şoreş û kerasatên Kurdan ji devê bavê xwe dibihîstin. Bavê min mirovekî xweşbêj bû.
Bi vê yekê min rêya nivîsandinê jî şopand.
-Sê dîwanên te yên helbestan hene; yek jê bi navê “Kevana Reş” e, yek bi navê “Ken û Girî” ye û ya din jî bi navê “Ez û Jîn” e.
Tişta ku bala mirovan dikişîne, her du gotinên “Reş” û “Girî” ne. Ji ber çi “REŞ” û ji ber çi “GIRÎ”?
Kevana Reş tu têkiliya xwe bi reşbîniyê re nîne. Ez her geşbîn im.
Ji ber çi Ken û Girî ? Tevlî ev qas hejarî, astengî, belengazî û zora ku ez û Kurd tê de ne jî, lê ez rijd im ku bikenim. Her û her ez hevrikê girînê me û divê ku bikenim.
Mixabin jiyana Kurdan, jiyaneke bigirî ye.
-Tu ji kengê ve helbesta renxeyî dinivîsî û gelo civaka Kurdî, bi çi awayî ji vî rengê helbestê nêzîk dibe?
Çawa ku di mijarên helbestê de bîrewer bûme, min helbesta rexneyî nivîsiye.
Ne hemî karên ku xelk dike mirov dikare ji wan çêtir an jî başatir bike. Lê wekî ku li ekranekê temaşe bikim, wisa li civakê dinihêrim û tişta şaş dibêjim.
Civaka Kurdî gelekî ji helbesta rexneyî hez dike, lê aliyên peywendîdar jê aciz dibin; xwe diqurmiçînin û didin nîşandan ku bi helbesta min hatine birînkirin.
Lê mebesta min ne ku êşandin û birînkirina tu kesî ye.
Dema ku dibînim li şûna du kitan, kiteke pêlav di lingê mirovekî de ye, yan jî riha mirovekî aliyek tiraşkirî û yê din na, wê hingê li bal min cihê rexneyê ye. Ez ê tiştekî jê re nekirim û ne jî wî biêşînim, tenê dibêjim wiha nabe.

Tê bîra min li Qamişloyê û wekî tolhildanekê, ez ji bo gelek şevbuhêrkên helbestî nedihatim vexwendin.

- Evê helbesta rexneyî, carinan hêlaye ku bersivên hişk an jî kiryarên çewt li dij te rûbidin?
Belê keko. Tu qaşilê birînên min radikî û min diêşînî.
Her û her ev nexweşî bi min re heval e.
Tê bîra min li Qamişloyê û wekî tolhildanekê, ez ji bo gelek şevbuhêrkên helbestî nedihatim vexwendin.
Rexneyên min bi giştî ne û tu caran min rexneya kesayetî nekiriye. Ez dixwazim miletê min di hemî aliyan de xebateke spehî û tekûz bike, tenê armanca min ev e.

Tevlî partiyan nebûm da ku bi serbestî pênûsa xwe bi kar bînim. Dibînim ku ez tevlî partiyan bibim, ez ê bibim mirovekî bi qeyd û kelemçekirî.

- Tu hevdemê gelek nivîskarên Kurd î; hem jî di yek bajarî de û li nêva yek civakê we xebata xwe kiriye. Lê tişta balkêş ew e ku hemî helbestvan û nivîskarên wê demê (Hejmareke gelekî kêm ne tê de) endamên partî û rêxistinên siyasî bûn, lê tu bi awayekî rêxistinî tevlî tu partiyan nebûyî. Tu biryara tevlînebûna xwe li nava rêxistinan, çawa şîrove dikî?
Ez çavên hemî helbestvan û nivîskarên wê hingê bi endamên rêxistinên wan ve, maç dikim. Ji ber ku rewşenbîrên wê demê ew bûn.
Lê çi li vir heye, pêwîst e mirovê helbestvan hişê wî vekirî be. Carinan jê berjewendiyên neteweyî û civakî li hember ên partîtî dijhev dibin.
Helbestvanên wê demê bûn endamên partiyan, ji ber ku pêwîstiya partiyan bi wan hebû. Lê car dî wan helbestavnan qurbanî dan û babetên partîtî li pêş nivîsîna wan dibûn kelem û asteng.
Ez dixwazim mirovekî serbest bim, û bi hişekî pak û vekirî ji êş û azarên gelê xwe nêzîk bibim.
Tevlî partiyan nebûm da ku bi serbestî pênûsa xwe bi kar bînim. Dibînim ku ez tevlî partiyan bibim, ez ê bibim mirovekî bi qeyd û kelemçekirî.
-Der barê helbesta sitranî de xebateke te ya berbiçav heye. Eger tu li ser destpêka şopandina xwe ji vê rêyê re û hetanî roja îroj, biaxivî…
Min tenê helbestek jî bi mebesta ku bibe sitran, nenivîsiye.
Îcar mijara ku helbesta min dibe sitran, ew li ser hunermendan dimîne. Dema hunermend dibîne ku dê heq ji helbesta min were der û bike sitraneke xweş, êdî ew ji xwe re bi awaz dike û disitrîne.
- Hunermendên ku helbestên te kirine sitran kî ne?
Belku hemî neyên bîra min.
Lê yên ku aniha li bîra min in, ev in:
Aram Dîkran, Beha Şêxo, Se’ed Ferso, Sefqan Orkêş, Eliyê Gavan, Şivan Mîdî, Laleş Mîdî, Koma Serxwebûn ya Rûdawê, Koma Narîn, Koma Cûdî ya Dêrikê, Yasîn ji Hesekê, Dilxwaz Behlewî û gelekên din...
Yên ku navê wan nehat bîra min, bila min bibexşînin.

Dema ku gule li milê min ket, gelekî kêfa min hat. Min got mala Xwedê sed carî ava ku li min ket û ne li zarok, yan jî li kalekî ket.

-Di 2011’ê de, dema ku tu li cenazeya Ş.Miş’el Temo amade bûbûyî, wê hingê ji hêla polîsên rêjîma Sûrî ve guleyek li milê te ket. Di pişt wê yekê re gelekan got: “Dildarê Mîdî pakrewanekî jîndar e”. Eger tu serpêhatiya vê bûyîna reş ji me re bibêjî...
Tu kes nexweşiyê ji xwe re naxwaze, lê dema ku gule li milê min ket, gelekî kêfa min hat. Min got mala Xwedê sed carî ava ku li min ket û ne li zarok, yan jî li kalekî ket. Ji ber ku ez li ser xwe bûm, min karîbû li ber dijwariya êşa wê guleyê xwe ragirim, lê eger zarok an jî kalek bûya, dibe ku tê de biçûya.
Wê demê min dît ku milet berê xwe da navenda bajêr, ez jî di rêza yekê de bûm û venegeriyam.
Îcar polîsan gule li me barandin û guleyek li milê min ê çepê ket û ez birîndar kirim...

Dikarim bibêjim ku her û her ez baca nerîna xwe ya serbixwe didim

-Di çend salên dawî de tu di kenalên ragihandinê de wekî bêjer derdiketî li ser ekranan û ev heye demek hew pêjna te tê...Tu li kû yî aniha û çi dikî?
Destpêka ku hatim Başûrê Kurdistanê, xelkê me yê Rojava bi dilgermî pêşwaziya min kir û qedrekî baş da min.
Wê demê Beşê ARKê li Zagros TV vebû û yekser vexwendin ji min re hat rêkirin. Îcar eger ne bi biryara min be jî, lê ez bûm yek ji damezrêneran. Zêdetir ji salekê hem wekî bêjer, hem jî wekî birêvebir min li Zagrosê kar kir.
Me gavine baş tê de avêtin. Naxwazim jî, lê neçar im ku bibêjim. Ji ber ku ez serbixwe bûm. astengî ji min re çêbûn û min dest ji kar berda.
Paşê ez çûm Rûdawê.
Lê kenala Rûdawê ez sal û du mehan mam. Careke din û ji ber ku ez mirovekî serbixwe me, astengî ji min re çêbûn û min bi fermî dest ji kar berda.
Dema min li ser fêsbûka xwe nivîsî ku min dest ji karê li Rûdawê berdaye, di yek şevê de 1600 name ji min re hatin.
Hinan nivîsîbû “Mixabin”.
Hinan jî nivîsîbû ku” Rûdaw bi çûna te xisirî”. Û gelek peyamên bi vî rengî.
Lê pirsa ku tevan dikir “ ÇIMA” bû…
Hin tişt hene mirov nikare bi awayekî ron û aşkere bibêje..
Dikarim bibêjim ku her û her ez baca nerîna xwe ya serbixwe didim.

Eger ne li ser asta Kurdên her çar parçeyên Kurdistanê be, li ser asta Kurdên Rojavayê Kurdistanê Med Tv yekemîn hevpeyvîn bi min re kir.

-Bawer dikim dema ku Med Tv di salên 90’an de vebû, hewldaneke wê hebû ku te li kenalê bixebitîne. Çi rastiya vê yekê heye?
Eger ne li ser asta Kurdên her çar parçeyên Kurdistanê be, li ser asta Kurdên Rojavayê Kurdistanê Med Tv yekemîn hevpeyvîn bi min re kir.
Paşê careke din hatin bal min û gotin em pêşniyar dikin ku tu bibî bêjer.
Min ji wan re got ku zarokên min hene û derfetên min ên maddî tune ne ku karibim derkevim Ewrupa. Wan ji min re got hema tu bibêjî erê, em ê bi hemî karûbarên çûna te ya Ewrupayê rabin û ji aliyê xwe ve te bi rê bikin.
Wê hingî jî careke din kelem û asteng çêbûn û hin kesan xera kir. Helbet ew kes ji hundirê kenalê bi xwe bûn û gotin ku Dildarê Mîdî kesekî ne pabendî karên rêxistinî û siyasî ye.
Heman nexweşî ye, û ez heman bacê didim.
-Herî dawî te helbesteke xwe bi navê “Cara Ewilî” li ser kêş û ritma helbesta Esme’î ya bi navê “Sewtu Sefîrî Elbulbulî “weşand.
Di malikekê de tu dibêjî “Min da ser şopa Esme’î”. Dildarê Mîdî wekî helbestvan, tu çawa li Esme’î dinihêrî û mebesta te ji hûnandina helbesteke wisa çi bû?
Esme’î yek ji şarezayên helbesta Erebî ye.
Esme’î bi awayekî pêlewanî û bi zimanekî bi xeml û xêz, helbestek bi navê “Sewtu Sefîr Elbulbulî” hûna, li pêş Ebû Cafer xwend û hêla ku Ebû Cafer şaş bimîne.
Esme’î bi pêlewaniya xwe giranî û dewlemendiya zimanê Erebî di helbesta xwe de diyar kir. Min jî da ser şopa Esme’î da bizanim ka zimanê Kurdî dikare bi kar û barên helbesteke wiha rabe yan na.
-Aniha hejmareke mezin ji rewşenbîr û nivîskarên Rojavayê Kurdistanê li Başûrê Kurdistanê dimînin...Xebata vê civata rewşenbîran çawa bi rê ve diçe?
Ez venaşêrim.
Tev de cihê rêz û hurmetê ne û pirî wan hevalên min ên nêzîk in.
Lê wekî karekî bipergal û sîstematîk, min bi xwe hêj nedîtiye.
Tenê li ser asta kesayetî hin nivîskar xwe li pêş dixin û tiştekî baş didin, lê wekî karê komelayetî, hîç xebateke berbiçav nehatiye kirin.
Jixwe wekî diyar e, hetanî Kurd hene, dê dubendî li dar be.
-Bi yek hevokê, helbest ji bo te çi ye?
Rihê min e.
-Qamişlo?
Te kezeba min anî xwarê.
Eger te bigota roja reş di jiyana te de kîjan bû, min ê bigota roja ez ji Qamişlo derketim.
Qamişlo pêsîrên dêya min e.
Nizanim ez ê sax lê vegerim, ne jî di pêçekeke ji pêçeka zaroktiyê mezintir de lê vegerim.
-Xewna te çi ye?
Ku ez Qamişlokeke sax û selamet bibînim. Dema dibêjim Qamişlo, anku tevahiya Rojava.
-Qehremanê te kî ye?
Bavê min e.
-Aniha çi dixwînî?
Dîwana min a dawîn a bi navê “Ez û Jîn” nû derketiye, ez lê vedigerim.
-Tişta ku te gelekî aciz dike?
Nakokiyên miletê min e.
-Tu li çi poşman bûyî?
Hingî ji welatê hez dikim, eger qedeha jehrê jî bidin min, ez ê vexwim û poşman nebim.
-Hevpeyvîna me bi dawî dibe, di dawî de dixwazî çi bibêjî?
Dixwazim bibêjim silavên min ji bo hemiyan hene.
Her careke ku hûn hevpeyvîneke wiha û silaveke wiha li min dikin; wekî ku hûn misînekî ava Hewdê Kewserê berdidin ber dareke ku dike hişk bibe; wiha hûn rih didin min.
Hêvîdar im ku sala nû, sala serkeftina miletê Kurd be.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Bang Bo Romantîkiyê

Nameya Yekem: Mihrevanî

AZAD -A-Z-X

Mihrevanî: Giranbuhatirîn merdî û bêhtirîn dayîn li ba XWEDA ye. Naziktirîn peyv, hêjatirîn û pîroztirîn hest li ser rûyê zemînê ye.
Mihrevanî, çenda şîrîn û nerm, li ser ziman û lêvan e!!
Çi ev peyv li ser ziman û lêvên min, bi saz û awaz e!!
Hest û dilê min zîz dike. Vîn û şiyanên min hêrs dike, canê min hembêz dike, leşê min dilerizîne.
Çi tîpên vê peyvê, bi naz û narînî li hev hatîne M_I_H_R_E_V_A_N_Î_!!!!!
Di kêlîkên herî zû de, min Dibexşîne. Di dema lez û zû de, min hembêz dike, hêmin dike, min diparêze, li min dibe xwedî, min dispêre cihê aram û aştî.
Hest û evîna min bilind dinirxîne, hest û dilê min tu carî, birîn nake, naşikîne.
Her dem û berî her dermanan, li ser birînên dil û can; derûn û leşê min dibe hetwan û belsem.
Mihrevanî zû dibe hêsir û rondik, dibare ji çavên min, diherike li ser hinarkên rûyê min, min ji gunehan dişû.
Dihêle ku ez hest bi şîrîniya jiyanê bikim û bi hêvîdarî li asoyên ezmanan binerim.
Mihrevanî dihêle ku ez bi erkê mirovahiya xwe rabim, dilsoz bibim, bawermend bibim, hestyar bibim û hest bi azadiyê bikim.
Mihrevanî, mirovahiya min dişû, zelal û sade dike, şîrove dike. Mihrevanî, daxwaz û wateya hebûn û jiyanê ye, reng û wêneyên cîhanê ye.
Dema ronahiya rojê her tiştî, zelal û sipî dike, bêdeng û bi nazikî di her derên reş û tarî de diyar dibe, tîrêjan vedide; mihrevanî ye.
Dema ronahî hêlma xunavê ya li ser dêmên jiyanê diçirûsîne û dibarîne, difûrîne, libên ava xunavan bê beranber û bi merdî diçirûsîne; mihrevanî ye.
Her demî û ji her tiştî re mihrevanî dibe derman û çareserî. Mihrevanî pîroziya evînê ye, evîn pak û pîrozbûna mihrevaniyê ye.
Berî mirov hest bi mirovahiya xwe bike, pêşiyê hest bi mihrevaniyê dike. Anku mihrevanî mirovahiyê bi ron û zelalî şîrove dike.
Bûyerên rastîn ên ku bi min re, rûdayîn...
Bûyera Yekem:
Ji mêj de ez li mihrevaniyê digeriyam, lê min li vî welatî nedidît (Welatê min, Rojavayê Kurdistanê).
Lê nebûna mihrevaniyê ez nediêşandim, jana nemihrevaniyê min nekişand. Hest û dilê min birîn nedikir, li ba mirovên vî welatî. Min mihrevanî nedît û hest pê nekir, ne li bBajarê Şamê, ne jî li Başûrê Kurdistanê.
Lê her demî hêvîdar bûm, ku mihrevanî dê hebe û diyar bibe, ew jî bi hebûna evînê û bi rûdana hestên nazik û zîz, ji dilên pak û zelal û soz. Rojek ji rojan.....
Bûyera Duwem:
Di Gulana 2015'ê de, min li bajarê Qamişlo kar dikir, karê bazirganiyê (Dikana keresteyên xwarinê û pêdviyên rojane).
Kar û danûstandina min bi mirovên civakê re bû. Kirîn û firotina min bi mirovên bajêr re bû. Li gorî rewşa heyî ya aloz û nearam, hem bi tirsa rûdana şer, hem kuştin û malwêraniyê, bazdan û koçberiya ji welat û bihîstina nûçeyên nexweş, bi bandor bû.
Her kes bêhêvî, bi tirs, bêgirnijîn û bêmad xuya dikir. Çavnebarî, nehezî hebû, çavtêrnebûn, qurebûn û paşketina civakî diyarde bû. Rêzgirtin û hevbawerî di navbera mirovên civakê de nebû. Min dît her kes, li rû bi rûyê bêhêvîtiyê, bêhêvî dibe; kes li kesî nedibû xwedî. Ji ber van sedeman, evîn û mihrevanî windayî bûn.
Min car caran ji mirovên kiryar (Bikir) Û yên bajêr re, dabaş û çêla evîn û mihrevaniyê, hem hêviyan dikir. Lê bê sûde bû, bê çare bû.
Piştî demekê, hêdî hêdî nebûna mihrevaniyê ez diêşandim û min hest bi nemihrevaiyê dikir. Jana nebûna mihrevaniyê, min ji kûrahiya dil û hestê xwe yî nazik û zîz û ji mirovahiya xwe yî sade û bêguneh dikişand.
Ji nebûna mihrevaniyê, dil û hestê min şikest û birîn dibû. Her dem û her kêlîk, min hest bi nemihrevaniyê dikir, digiriyam, rondik û hêsir dibariyan. Mirovahiya min melûl û canbêzar dibû, min hest bi tenêbûn û bêkesiyê dikir. Hêvîşikestî bûm, baweriya min bi her kesî re şikest.
Min xwe diavêt li ber bextê hêviyan û bendewariya mihrevaniyê, nazikiyê. Min xwe diavêt hembêza evîn, mûzîk, stran, saz û awazan.....
Bûyera Sêyem:
Di rojên meha 11'ê de (21-22-23-23…) li sala 2015'ê…
Miroveke pîrozdar û xwediya mirovahiyeke pak û bilind, di jiyana min de bi rojane dihat û diyar dibû…
Xwendekareke keç î kurdewar bû. Rûmetdar, bihadar û dilnewaz bû. Serbilind û bi şanaz, hêvîdar bû. Ez li hêviya wê dimam, di dema hatina wê de, heta hat û dibûrî. Heta hat û vedigera jî…
Nûgihayeke nazik û mihrevan bû. Dil û hestê wê yî ron î zelal, dil û hestê min geş û pîrozî dikir, mirovahiya min hembêz dikir. Evîna min dibir. Girnijîna lêvên wê mihrevanî bû, dema digirnijî, çirûsk vedida.

Evîna wê jiyana min diguhert. Ew û evîna xwe diket nava dil û canê min. Bi hebûna wê , bi evîna min û wê mihrevanî diyar dibû.
Zivistan sar û tarî bû, evîn difûriya hêlim jê rabû, dibû mihrevanî dibariya, baran dibariya, rondik û hêsirên çavên min dibariyan, dibariyan, dibariyan,dibariyan...
Dihêla ku ez mihrevaniyê bibînim.
Her cara dihat û diyar dibû, bêhna mihrevaniyê dihat, min hest bi mihrevaniyê dikir.
Bang bo mihrevaniyê...
Bang bo romantîkiyê, da ku em di

DIYARDEYA DIJAYETIYÊ

Da ku mirov karibe di roja me ya îro de pêşketinên zanistî di hemû aliyên jiyanê de rihet bişopîne, fêrbûna zimanekî biyanî bûye hewcedariyeke mezin.
Ji ber vê yekê her kes dixwaze xwe hînî zimanekî din bike û bi taybet kesên rojnameger, siyasetmedar, lêkolîner û rêvebir…
Her wiha malbat jî, zarokên xwe hîn di temenên biçûk de ber bi zimanên biyanî ve diajonin, bi taybet ber bi zimanê Ingilîzî ve(Zimanê zanist û teknolociyê, wekî ku tê binavkirin).
Ji vê yekê girîngiyeke mezin didin vî alî, bi mebesta ku karibin bi hêsanî zanistê bi hemû pêşketinên wê yên nûjen ve bişopînin û bi dest bixin.
Bê guman fêrbûna zimanekî biyanî girîng û pêwîst e, her wiha tiştekî rast û durist e; ji ber ku ji bo veguhastina zanist û teknîkê ferz bûye. Her wiha gelek sudên din ên fêrbûna zimanekî din hene.
Mirovê ku fêrî zimanekî biyanî dibe, tê wateya ku fêrî çandeke nû, dîrokeke nû; nerît, irf û adetên nû dibe…Ev zimanê nû, alîkariya wî di fêmkirin û naskirina kes û gelên din de dike. Her wiha dibe navgîneke pir baş ji bo danasîna gel û dîroka xwe bi gelê din.
Hem jî mejiyê wî çalaktir dibe û asta hizirîn û afrandinê li bal wî bilindtir dibe û di aliyê aborî de jî gelek derfetên kar ên nû li pêşiya wî vedike.
Lê tişta ku gerek e mirov jê haydar be û baş zanibe ew e ku divê fêrbûna wan zimanan ne li ser hesabê zimanê mirov ê resen be, anku zimanê dayîkê be.
Divê mirov ji zimanê xwe yê zikmakî nereve, biçûk nebîne û zimanên biyanî di ser re negire.
Mixabin, di roja me ya îro de ev halê gelek Kurdan e. Kurdên ku xweşikbûn û bedewiya zimanê xwe yê Kurdî nabînin û dewlemendiya wî hîs nakin. Her wiha zimanê xwe bi bêsûd û bêpaşeroj dinirxînin û di gelek cihan de jî li dij derdikevin..!
Nizanin ku dema ew nirx û qîmet didin zimanê dayîka xwe û bi serbilindî fêrî dibin û pê diaxivin, ew qasî ew ziman bi pêş dikeve û di çavên her kesî de mezin dibe.
Her wisa pêwîst e zanibin ku pesendkirin û mikurhatina li vî zimanî, ji wan dest pê dike. Çi qasî asta pêhesîna wan bi girîngiya zimanê Kurdî mezin be, ew qasî ziman tê parastin û bi nirx dibe.
Tişta hêja ye mirov zanibe ew e ku bikaranîna zimanê dayîkê di daneheva zanist û perwerdeyê de û fêrbûna zimanê dayîkê, wekî ku hemû lêkolîner û zanyarên pskolojiyê teqez dikin, tiştekî pir girîng e.
Zaroka ku fêrî zimanê xwe yê zikmakî nebe û di vî alî de ne têr be, dê di paşerojê de her danehev û wergirtina wî ji zanist û perwerdeyê re kêm bimîne. Ji ber vê teqez dikin ku nabe zarok fêrî tu zimanan bibe heta baş fêrî zimanê xwe yê dayîkê nebe.
Yan jî herî kêm bingeheke wê zarokê ya saxlem û xurt di vê der barê de çêbibe, ta ku karibe di demên pêş de zanînê bi awayekî baş bigire.
Tişta vê yekê jî piştrast dike ew e ku piraniya welatên dunyayê, zarokên xwe di salên pêşîn ên xwendinê de tenê fêrî zimanê wan dikin û piştre zimanên biyanê derbasî metiryalan dikin . Gelek ziman li cîhanê hene ku hem bi kevinbûn, hem jî bi dewlemendiya xwe bi gelekî ji zimanê Kurdî kêmtir in; lê tevlî vî tiştî jî, dest ji zimanê xwe bernadin û pê serbilind in.
Li hemberî wan zimanan, zimanê Kurdî zimanekî kevnar û pir dewlemend e û gelek şaristanî di seranserî dîrokê de hewandine; tevlî wê jî gelek Kurdên me ji vê rastiyê dûr in û nirxê vî zimanî nizanin.
Pêwîst e em zanibin ku ziman hêmanê sereke yê avakirin û lipêşxistina kesayet, nasname û çandê ye. Her wiha ziman alava sereke ya peywendiyên civakî û bipêşvebirina zanebûna mirov e. Dêmek her perwerdekarek, her wiha dê û bav pêwîst e zarokên xwe ber bi zimanê dayîkê ve biajonin û vê girîngiyê bi wan bidin naskirin.
Di dawiyê de em gotineke NÎLSON MANDÊLA di vê der barê de bîr bixin:
"Dema ku tu bi mirovekî re bi zimanekî ku jê fêm dike diaxivî, axaftina te digihêje mejiyê wî. Lê dema ku tu bi zimanê dayîka wî pê re diaxivî, axaftina te digihêje dilê wî."

ARAM HESEN

GURZO

Agît Yazar (Egît Jahrîyûs)

Berî ku Romana Gurzo derkeve, ez naxwazim razên Gurzo bidim der û kelecana berdevk û wergêrê (Nûserê Romanê) Gurzo bişikînim.
Ez xwe diavêjim dexlê xwînerê vê nivîsê, da ku vê çikûsiya min bibexşînin (Cênîka serê min bi xwe, ji merivên çikûs diêşe. Loma hûn nebexşînin jî, tu gazind ji we nabe. Yanî hûn bi qîma serê xwe ne).
Bê guman romaneke ku hatibe çapkirin, gelek tişt dikarin li serê werin gotin û nîqaşkirin. Lê romaneke ku hîn nehatibe çapkirin, zahmet e ku meriv çi bi çêyî, çi jî bi xerabî karibe nirxandinekê li ser bike û hestiyên çend peyvikan di curnê galegalên serberradayî de bikute (Bi gorna pîrika min Hecî Fatê, ez dibêjim qey bayê helbestên rêzdar Ehmed Huseynî li serê min xist).
İ'ffffte Egît looo! Tu çi qas zilamekî lewlewok î! Li mijara nivîsa xwe vegere camêêêr.
Yan bi xwe biqurrince û yan jî mûyê pişt hustê xwe bikişîne. Da ku tu li ser hişê xwe werî. Bi bîra te dixînim, mijar: Romana Gurzo ye.
Heta niha min du beşên romanê xelas kirine û ez niha di beşê sêyemîn û yê tewra dawî de me.
Heger ez li xwe mikur werim, ez romana Gurzo bi kelecan û bi helkehelk dinivîsim. Ew qas besta min lê radibe û ez xwe berra li ber didim, yek caran ji dêlva ez bipeyivim, ez dixwazim birreyim.
Erê erê, we şaş fahm nekir! Ez dixwazim birreyim. Ma hew reyandin? Na Wele. Yek caran dixwazim bizûrim jî! Ma hew zûrandin? Na bi serê Gurzo. Car caran jî dixwazim bibêjim kaaaaz, kaaaaz, kaaaaz û terkîdinya bibim(Min bibexşîne Gurzo. Lewra min rista te ji te dizî. Tu dibînî Gurzo ne! Tu dibînî bê em meriv çi qas mexlûqatine çavnebar in û di her kêslêhatinê de xwe li her tiştên we radikişînin û xwe lê dikin xwedî).
Li vir ez dixwazim biçelpînim nav û pirseke dînane bipirsim: Gelo eger Gurzo, romana Egît (Ez, tu, wî, wê, wan) binivîsanda, dê çi çêbûba?
Ez bawer dikim ku tenê kûçikekî poz û bêvil bi wê romanê nedikir û nedixwend.
Heta dibe ku hinekan ji wan ew roman bibira û daniya li ser tûmikekî, nigekî xwe yî dawî bilind bikira û destava xwe di ser de bikira(Aha, bi îman hindik ma ev mijar biçirvire!).
Berî ez şax, pax û xaçerêkan ji mijarê berdim, ez dixwazim dîsa li romana Gurzo vegerim…Ez wa bawer dikim ku wexta romana Gurzo derkeve, dê gelek kes Gurzo bişibînin Bazin, Hirço, Teyrê, Qafreş, Şêro, Qerê, Reqso, Şerrê, Kejê, Gundor û Guhdar.(Li nêva Kurdan, ev nav li kûçikan tên kirin).
Heta dibe ku gelek kes ji ber ku Gurzo ji kûçikê wan wêrektir û zîrektir e, ji Gurzo bihesidin jî.
Kî çi dizane, dibe ku pir kes ji bo karibin bibin xwedî kûçikekî nola Gurzo, kirrekirr ji dilê wan were.
Di vê pêvajoya nivîsandina romana Gurzo de, ez li gelek kûçikan qesidîm û li wan bûm mêvan. Çi kûçikên kolanan, çi kûçikên di sitargehan de, çi kûçikên seydê, çi kûçikên di nava malan de, çi kûçikên bêhnhilanînê û çi jî kûçikên şivanan.
Wan tevan derî li min vekir û mazûvaniyeke pir baş ji min re kir, heta ew hestîkê di devê xwe de jî bi min re parve kir (Li ser meselê yanî).
Rojekê ji rojan, bi tenê yek kuçikî mirûzê xwe bi min re tirş nekir, ji min re negot kewt û bi min de nereya. Ez ji wan tevan re sipasdar im.
Ez hîn jî serlêdana xwe dikudînim. Beriya çendekê ez rabûm çûm sitargeha şaredariyê ya kûçikan. Çawa çav li min ketin, tev de rabûn, hatin ez pêşwazî kirim û li dora min çûn û hatin. Haybûna ez ji xwe hay bûm, min dît ez destvala çûme sitargehê.
Yeqîn bikin ji fediyan re û ji ber ûda rûyê xwe(Ez bê henek dibêjim) min xwest erd biqelişe û ez têkevimê. Min soz da eger careke din ez herim sitargehê, teqez ez ê destvala neçim.
Hinek ji wan bi sê lingan bûn, hinek jê bi çavekî bûn û hin ji wan mabûn çerm û hestî; serî bi vî alî de, qûn bi wî alî de diçû û ji lawaziyê ditewtihîn. Ew çend lawaz bûn, edetî hestiyên wan di çermê wan re diçûn. Çirûska jiyanê di çavên wan gişan de tefiyabû û ruh digerandin; hemûyan serî ji çarenûsa xwe re tewandibû û li benda roja mirina xwe bûn.
Li vê derê ez têgihiştim ku Gurzo ne yek ji van kuçikan e.
Min cûreyekî kûçikên din jî dît. Ev cûre kûçik jî bi zikekî têr û duyê birçî dijiyan. Aha ev cûre kûçik, kûçikên parîkan bûn. Kê parîkekî nan biavêta ber wan, teriya xwe dihezikand û li ber devê deriyê hewşa wan direyan.
Heşayî Gurzo, Gurzo ne kûçikek ji van kûçikan bû.
Min hinek kûçikên din jî dîtin. Bi goştên kelandî dihatin xwedîkirin. Te mû ji wan bikişanda, dê dohn tê re bavêta. Meriv digot qey te bi destan, goşt hepisandiye bin eyarê wan. Qelew û çavsorî bûn. Di pişt deriyê hesinî de û bi zincîrên sitûr girêdayî bûn. Ji gewîtî, edetî dibeziyan siha xwe. Piştî wextekê aqilê wan çelq dibû û heta xwediyên xwe yên xwedî jî, nas nedikirin. Bê guman, Gurzo ne kûçikek ji van kûçikan bû jî.
Gurzo ne ew e, ne ew e û ne yê din e! Baş e, lê Gurzo kîjan e?
Gelo Gurzo reşê şevê ye?
Gelo Gurzo lehengekî kesnedîtî ye?
Bersiv di romana Gurzo de nixumandî ye.
Bi kelecan, ez jî li bendê me.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Hadî Behlewî

Helbestvan Hadî Behlewî di 16'ê Gulana 1948'ê de li gundewarê Qamişlo çavên xwe li jiyanê vekirine.

Xwendina xwe û salên ciwaniyê li nava kuçe û kolanên Qamişloyê diqedîne. Hetanî aniha jî, her li bajarê Qamişlo dimîne.

Ji 1965'ê ve dest avêtiye pênûsê, da ku bi her du zimanên Kurdî û Erebî helbestê binivîse.

Bi dehan ji helbestên Hadî Behlewî bûne sitran û hunermendên wekî: Se'îd Gabarî, Buha Şêxo, Adil Hiznî, Hisên Bavê Azad û Selah Resûl helbestên wî bi awaz kirin û sitrane.

Du berhevokên Hadî Behlewî yên helbestan hene, yek jê bi navê "Ji Dil" e, yek jî bi navê "Wê Sibe Bê" ye.

Helbestvan Hadî Behlewî di geşta nivîskariya xwe de, "Xelata Mele Ehmedê Palo" di salvegera wî ya duyemîn de wergirtiye.

Newroza Sala 2008

Li çarçewa dîrokê de..
Li gerrînka hebûn û nebûnê de..
Li jiyana berovajî de..
Xewnên min î şêrîn dibûn kabûs
Li ser sînga mi rawestiyan..
Hêviyên geş, wek hespê şemûz
Li orta dil pîkolî dikrin
Bûn: Mij û leylan..
Pelê deryayê şînê, em xeniqandin..
Mirinê, bi tinaziyên xwe, em gez kirin..
Qîlê xwe, di laşê mi de çikand..
Goştê min, çirandî..
Kir perçe û par
Kir zîvar zîvar
Birîn, diaxive, hê germ e..
Dev, nehatiye girtin..
Li ser lêvê wê, çend pirs û raman
Bi hev re civiyan
Ta kengî em ê xewnên jibîrkirî bin?
Qurbaniyên bê nerx..
Bi destê tewankar:
Sindoq bin li ser Milan?
Mêvanê goristana bin?
Balgeh..kevir be..
Lihêf..axa sar?
Bê cî, bê lûs, bê war
Li ser zemînê??
Ho Qamişlo
Qamişloka rengîn î..
Bi endazî, tû lêkirin..
Bi rêk û pêk, tû çêkirin..
Bi heyv û xaç û roj, zîba kirin..
Tû kirin: Şanika bajarvanî û şaristaniyê..
Bajarê : Jîn û evînê..
Min ji te hez kir,
Û hîna, min xetê simbêla rast nekiribû..
Min hezkirin, bi te re nas kir û dît..
Gulê sor
Teka teka..qevde..gurz
Diyarî min dibûn
Min jî, ew dihonan
Dikirin: Ristik, dixistin qirka te..
Dikirin: Zerazeng,
Datanî ser sîng te..
Dikirin: Şûhî, 'Eyas e,
Li noqa te dipêçan
Ne wek zinara ku pêçane
çuqlî û tirhik, qurmiçandin
Pelê darê, weşandin
Şûhiya li pişta te, qetandin
Zik-diran bi potînên xwe,
Gulê sor, perçiqandin
Mawerd û erxewan, ji wan herikandin
Pendên Muhemmed pêxember, çirandin
Bi ayeta dawî, kevok sipî kirin nîşan
Tû kirin: Bajarê xwîn û şînê Hinga..
Mîjoyê rahîşt çuqlîkî, û kire: Pênûs
Û noqî kortikek xwîna pakrewanekî kir
Û li orta dû heyvoka xweşxwana û
Got:
Ez nema serî ji we re ditewînim
Ez ê rêzbenda biçirînim
Werin..werin..werin
Hevok..
Pirs..
Wêne..
Mînak..
Awaz..
Destê hev bigrin, bibin şerîpan
Li pesarê "Hilêlîkê"
Bi xortan re li çepika xin
Bera terbterba lingê we
Herî izmanê hefta
Govenda li dar xin
Ji bo Helbest
Daweta

Li ser dîwarê demê nivîsî:
" Mirin Jiyanê Tênî "
Îşev Newroza dû hezar û heşt
Diyar e, dîrok xwe vedigerîne
Û pêxwas û bê nehat dil bikîn e
Û mista tovê serbilindayiyê ku min
Wê demê li ber kortik û mesîlê
Tejî xwîn e
Min çandibû li ber dergehê yana û nexweşxana
Û mizgeftên welat û li cade û duryana
Ji bo rehê xwe berde
Û dara evîna te Qamişlo şipya bimîne
Diyar e, ku ew naxwaze wê darê bibîne
Tewana ya çar sala li te vegerîne
Lê mixabin
Ji dîrokê dersa nasitîne
Çiya nahejîne



Li pişta Cizîrê
Ji Dêrik…heya 'Efrînê
Qamişloka min
Berî çar sal û hêşt rojan
Dem buhar e, mehreş ke avdar
Wisa jî dû hezar û çar e
Wek 'ewrekî reş bi gulpan
Ser te kir tarî
Bahozek ji kîna reş
Bi ser te de hat xwar
Reqreqa tavên fîşeka çar kenar
Gullebaran dikirin fîzfîz
Buhar kirin payiz
Dara evîna te Qamişlo, şikandin
Û darê ku dişikîne
Û pelê diweşîne..
Û wan wêran dike û dişewtîne..
Nizane ku ew bixwe
Xetiran geş dike
Û agirê Newrozê
Bi Kurda re
Pêdixînê.
Helbest..
Bêhn tang
Li defa hewarê xist
Û bi dengê bilind
Ban kir
Gazî pêlewazan û hespê

Mihemed û Mihemed û Mihemed
Bi cî bîne.

Cejna Evînê

Xwedêyo ka çi hêja ye ko rêkim?
Eva cejna evînê tê bi rê de
Ez ê çavan jê re bikim diyarî
Mixabin xwîn û zox rijiyana pê de
Ji dêla hêstiran xwîn va dibarî
Gelo hêja ne esta Cana tê de?
Ez ê gulên ji bêhn jê 'r bişînim
Ji gulzar û kulîlkên l' vê dinê de
Bi destê xanima hatin guvaştin
Li Parîzê û li London, yan li vê de
Yeqîn nakim ko hêja bin diyarî
Tevlî market bi navdar bî bi zêde
Ez ê helbestekê jê re bihonim
Ji hestê xwe di germbûna kelê de
Bi aza kim elîf û bêya û nûn
Jiyana xweş ko vîn serbest bî tê de
Bera razê evîn tê de bixwînî
Heya mexrib ji berbanga sibê de
Bi gomanê ko ev jî, jê re nabin
Ji ber helbest bi xwe 'v Cana girêda
Ez ê tilyê xwe vêxim rengê mûma
bikî ronî, li dû reşya şevê de
Meger razî nebû Cana ji vana….
Rewan û can didim, bê nerx û fêde

Sibê Wê Buhar Bê

(Di Pêxistina Şoreşa Gulanê De)
Wê bi serdana me buhar
Sibê wê bê
Wê xunçe bidin devî û dar
Newroz wê bê
Kulîlk û gul
Birevînin xeman ji dil
Bêhn vexweşî li şûn û war
Sibê wê bê
Buhar wê bê
Wek nerîna van biçûka
Çiya û agir
Bi xemlên pir
Xwe rapêçin bi sor û zer
Wek nû kincên qîz û bûka
Sibê wê bê
Wê bilbil bike qebqeb û nal
Teyr û tilûr bimînin lal
Qumrî û Qaz
Wek çeng û saz
Vêk ra dibin dost û heval
Jê re dixwînin dîroka
Dilşad dibosin dest û pê…
Buhar wê bê herî cem wan
Pîroz bikî dest û zozan
Hêvî li welatan şîn bike
Dergeh, li dilê tarî veke
Ev avê sar
Xweş bîne xwar
Ji cobar û çem û coka
Buhar wê bê
Xelkên beyan li hawêr me kirin tevger
Wan pir kirin bêhêvîbûn, rewrewk û tar
Mij û moran
Li ber çavan
Bi girêka kûr..didan girêdan
Derîyê jînê didan girtin li pêş zaroka
Dema sorgul nema ew tê..
Buhar wê bê, piçûkê min li ser şaxa
Li erdê me, li deşta me, li qûnaxa
Buhar wê bête zozana lê lê qîzê
Gira bişo ji qirrêja vê payizê
Heyvê li izmana biçînî
Wê çîmen û gulzaran
pelê daran sema bikin
Li remza bê..
Egere dîsa buhar xweş bête van waran..
Wê çûk û çivîk bibêjin jê ra gotaran
Ko hêlînê wan wêran bûn
Li ser lata, li ser tehta, li ser daran
Sibê wê bê…
Sibê wê bê
Buhar wê bête warê me
Dinê bibînê wê paqij ke
Bi kesk û sor çavan kil ke
Bi serbestî bijîn tev de
Pîrê merdên me tev zaroka
Dem ewê bê.

Min Riha Ke

Min riha ke, min bihêle, dûrî deryayê evînê
Aqil û sewdan ji min tev de, ketin gêra neyînê
Min bibore, ez nema karim evan derdan hilînim
Ketme navbeyna dû aran..min disjoin, mi dhelînê
Arê hecra dîlberê sohtî ji min cerg û kezeb
Arê soza ku me dabû ji xwe vê nazenînê
Lewra arê didiwan bêhtir b' rivîn û pêtiye
Arê dûrî tê mirandin ew bi nêzîk û dînê
Min bibore ez mirov im, ne ku hov im bê his im
Ez wekî te ji herî û avê me, jê hatim birrînê
Te ji xwer dergeh bi alîkî dikir ku bêm dilê te
Bo çi tû xwe j' vî dilê nazik û terr dûr dûr dixînê?
Ne piçûk im wekî zarokan li dû hestan dibazin
Ne jî tirhik terr ku bayek wê bibî, yek wê werînê
Tenê carek min bihêlî ku kêlîkê dîn bibim
Tê bizane wek min evîndar tinne ne l' ser vê zemînê
Tê ji min berfa sipî deynî li ser sînga gever
Hûrehûr mûmê zerî şimma kirî lê bilivînê
Destê xwe l' dor qirrika min bide hev, asê bike
Min biparêze bi tirs e kes ji destan nerevînê
Tê ji wan lêv û devan maçek bidî min bê buha
Jê binoşim da ku tîna vî dilî xweş bişikînê
Ger te dî destê m' direj bûn, çûne sêvên paxilê
Yan jî xwestin ji riwê te: Guleke sor biqetînê…
Hinga tê b' wan her dû perçên ji şevê tên ker kirin
Her dû destên min bi wan baş pê girêd û bişidînê
Ta te kêfa xwe buhart û te bi min ûmîd nema..
Min bidehfîne di gerrîneke bê qam, min bixînê
Ger ji gomanan tû bilya û warê mirinê
Lewra hacet me nema êdî bi vê dîdin û dînê..
Min li navbeyna du qewsê ebriwan berg or bike

Te go:"Na..Na"

Bi"na" tû pir mi dêşînî
Mebê "na" bes
Çi daxwaz te hebin, dil bo te pêk tînî
Dikim gorî te can û gav
Weyan mêlak û cerg û çav
Weyan dil jî, ji te r' riswa bikim cana
Bera tenha xwe bit bo te
Diyarî koz û hêlînê.
Bes e difre..çima tû guh li min nakî?
Gidî surma te na bi xwar
Eger tû carekî ba kî
Ji te ez hez dikim bê kam..
Ne wek keç-xal û hem dotmam
Ji ber çavê mi naçî qet dem û dana
Bibêje, ger bi te tal im
Li ba min tû şêrîn î
Dixum sûndê: Ji min tû hez dikî bêtir
Belê serma te pir zor e
Evê sermê ji te dil bir
Eger tû poz bi min nakî
Nerîna xwe bi min şa kî
Evîndaran tû aza bik ji zindanan
Di wê çaxê:
Jiyana min bi dîna te dibit şînî
Di vê rê de..dizanim wek mi dildar î
Hero pê de..dilê nermîn, disojî, Pêtiyê arî
Bi qîr û dad û hawar î
Diçî tê roj û êvarî
Bi hêz û lerz ji bo derxî kul û jana
Mebesta min erê şoxê:
Rihakî dil ji vê kînê.
Nehêle ez li vîna te bibim poşman
Mebesta min: Nerînê l' min tû
Xweş sa kî, nekî erzan
Li cem min tim bibe mêvan
Ji hev hez kin bi dil û can
Bi saxî ger neyî ba min bi serdana
Dema bimrim..
Gelek beyhûde ser min tû bikî şînê

Kultûrname

DEWLEMENDIYA FOLKLORA KURÎ (3)

Zeynulabidîn Zinar

Ji xwe di beşa Gotinên Pêşiyan de, dewlemendiyeke pir mezin heye, wek dersê rênasiyeke mezin heye, nîşandana xilasiya ji riyên şaş û xelet heye.
Îcar çi kesê ku wateya van Gotinên Pêşiyan bi awayekî kûr têbigihîje, dikare wan bike wek dîwarekî ji polayê û xwe li pêşberê asîmîlasyon û hemû êrîşên dirinde jî biparêze.
Berhemên Folklorî bi rewşa naveroka xwe, kurt û dirêj hene. Hin ji wan pir dirêj in û hinên wisa pir kurt hene. Di wan de hin xeyal û fentezîyên derdemî hene ku aqilê mirov wan tiştan napejirîne û ne jî mimkun e ku mirov karibin wan tiştan bi hêz û biriya xwe bikin. Ji ber ku ew serbest in û çawa ji wan re xweş hatiye, her wisa ji xwe re berfireh kirine.
Çendî ku nayên pejirandin jî, lê helbet ev hawe, di warê vêjeyî de, xweşiyeke pir zêde jî derdixînin holê û gava mirov wan Çîrvanokan dixwîne, pirî ku xwendina wan li mirov xweş tê, mirov naxwaze dev ji wan berde.
Çawa ku em dibînin, ev e bi sedê salan e ku Neteweyê Kurd bindest e û gelek cewr û zordestî li ziman û toreya wî jî hatine kirin. Xasma jî di vê sedsala bihurî de, gelek rûdan lê hatine kirin, siqûmat û karesat û hovîtiyên pir mezin bi ser ve hatine û ew taromar kirine, lê belê wek netewe dîsa jî hebûna xwe ya nijadî heta îro jî parastiye. Ev parastin jî, bi du tiştan çêbûye:
a) Ji ber ku Neteweyê Kurd, dev ji zimanê xwe bernedaye.
b) Ji ber ku Neteweyê Kurd, dest ji Toreya xwe bernedaye.
Sedemê ku ez jî zêdetir li ser Folklora Kurdî radiwestim û dilqê wê yê erênî derdixînim pêş, ev e ku tê de girêdaneke pir xurt bi hemû pîroziyên neteweyî ve heye.
Niha mirov çi bixwaze, dikare wan daxwazên xwe di nava çirok û meselok û gotinokên folklorî de bibîne.
Toreya Kurdî jî, beşek ji Folklora kurdî ye. Di Toreya Kurdî de demokratî, mirovatî, rêzgirtina li pêşberê hevdu û biratîya kesan, bi awayekî vekirî û pir eşkere jî hatine pêşkêşkirin.
Wek mînak:
- Kurd navê kesê jixwemezintir hilnadin, ji bo rêzgirtina zilaman dibêjin: Mamo/apo, keko, xalo, pismam, heval, bira û hwd...
Ji bo kesên ji xwe piçûktir jî dibêjin: Birazî, xwarzê.
Ji bo jinên jixwemezintir jî dibêjin: Metê, xatî/xaltî, heko.
Ji bo yên jixwepiçûktir jî dibêjin: Xwarza, biraza.
Kesên hevjiyên hev jî, ji hev re dibêjin: Heval, bira...

Berdewamî di hejmara bê de ye...

Berhemên Nû

Bi Navê "Leylan"…Yekemîn Dîwana Helbestan a Sala 2018'ê li Qamişlo Derket



Dîwana "Leylan" ku di destpêka 2018'ê de ronahî dît û ket nava destên xwendekaran, a nivîskar Îmad Hemdî ye.
Ev dîwana helbestan, di nava xwe de bi dehan ji helbestên evînî vedihewîne.
Bi awayekî kêşesaz û biritim, nivîskarê dîwanê hem evîna xwe, hem jî janên xwe vedibêje.
Îmad Hemdî ku danerê dîwanê ye, ji beriya aniha du zarokên wî di deryaya Îcayê de binav bûn û jiyana xwe ji dest da.
Herî dawî jî keça wî ya 6salî ku bi navê Leylan bû, di teqîna Qamişlo ya 2016'ê de jiyana xwe ji dest da; ji vê yekê dîwan bi navê Leylan hat çapkirin.
Ne tenê wisa, lê di heman teqînê de lawê Îmad Hemdî bi giranî birîndar bû û hetanî niha pêwîstiya wî bi îlac û dermankirinê heye.
Îcar nivîskar Îmad Hemdî dibêje: "Ji beriya aniha min biryar dabû ku piştî sersala 2018'ê ez ê nişstergeriya lawê xwe çêbikim, da ku sîxên di lingên wî de bên derxistin".
Hemdî dewam dike:
"Hat bîra min ku di teqîna Qamişlo de 2 destxetên min winda çûn; ji vê yekê min got ez ê bi pereyên nîştergeriya lawê xwe, dîwana "Leylan" çap bikim û nîştergeriya lêwik, ji bo demsala havînê li paş bixim".

Kurdî Xweş e

Parêzer ناشط	Sazvan عازف
Rahêner مدرب	Awazdaner ملحن
Afrêner خالق،مبدع	Komîte لجنة
Rexnegir ناقد	Deste هيئة
Tor شبكة	Girnijîn ابتسامة
Xwepêşander متظاهر	Çalakvan ناشط

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2						■		■	
3				■	■	■			
4						■	■		■
5		■			■		■		
6				■					
7	■		■				■		
8			■			■		■	
9						■			

Sitûnî

1-Demsala herî germ – Ji hejmaran
2-Çemê ku li perava wê şerek di navbera Berzanî û Farisan de çêbûye – Dirav
3-Bajarekî Bakurê Kurdistanê – Ferîq
4-Ap – Du tîpên wekhev – Zîrek
5-Cînavekeke pirjimar – Du tîpên wekhev
6- Du tîpên wekhev – Ap
7-Cînavekeke pirjimar(Vajî) – Çiyayekî Kurdistanê (Vajî)
8- Usman bi Kurdî – Paq
9-Ramanhez, mufekir

ASOYÎ

1-Gazî – Sorî tarî
2-Hêmin – Sera belavkirî
3-Cînavka şanîdanê ji bo kesên nêzîk – er – Du tîpên wekhev
4-Devera ku rok nagihiyê (Vajî) – Ap – Nezîr bi Kurdî
5-Destpêka nexweşiyê – Sera belavkirî
6-Dest
7-Jimareka demê
8- Er – Hêmin, bêdeng
9- Devereke Başûrê Kurdistanê ku li ser sînorê Rojhilata Kurdistanê ye.

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Sitêrname 7

Narîn Omer

Hunermenda me, di dema sitranbêjiya zêrîn de jiyaye. Gulbihar, hevdema gelek hunermendên navdar e, yên wekî: Mihemed Arif, Îsayê Berwarî, Nisrîna Şêrwan, Hesenê Zîrek, Eyşeşan,Tehsîn Taha, Mihemed Şêxo û gelekên din…Ewê bi hesanî karîbû cihê xwe di nava wan de bigire.

Jiyana Wê:

Hetanî niha jî qonaxên jiyana wê yên pêşîn ne diyar in. Dibêjin ku ew di 1932'yê de li Amêdiyê ji dayîk bûye. Ji ber sedemên zor, malbata wê koçî gundê "Kocanzê" yê Bakurê Kurdistanê kiriye, û di sala 1949'ê de dîsa li warê xwe vegeriyaye.
Navê wê yê rastîn Fatima Mehmed e, paşê di jiyana xwe ya hunerî de navê "Gulbihar" ji xwe re hilbijartiye.
Dema ku malbata wê vedigere Başûrê Kurdistanê, temenê wê 17 sal bû. Wê demê Gulbihar yekser berê xwe dide Bexdê û li wir tevlî koma radyoya Iraqê dibe.
Her wiha di koma Yehyayê Fayiq de jî dibe weku dengbêj, lîstikvan û Şanoger. Ev destpêk, dergehên navdariyê jê re vedikin…
Paşê koma Çardehê Temûzê wê wekî endam qebûl dike, û televizyona Bexdê jî wê wekî lîstikvan ji bo çend fîlman de hildibijêre; ji wan filman: Gula Sor û Bûka Feratê.
Ew bi zimanê Erebî bi van karan rabûye, ji ber ku hetanî dawiya salên 50'iyan jî ew wekî hunermend, di nava Ereban de navdar bû.
Ji destpêka salên 60'an û bi şûn de, êdî qonaxeke nû di jiyana Gulbiharê ya hunerî de dest pê dibe û ji civata hunermendên Kurd ên navdar hêj nêzîktir dibe. Di sala 1963'yê de xewna wê pêk tê, ew jî dema ku sitrana xwe ya yekemîn bi zimanê xwe tomar dike…Êdî dikeve rêza hunermendên Kurd ên navdar û cihê xwe bi xurtî li nêva wan digire.

Doktor Ferîdon Hirmizî dibêje:

"Gulbihar yekemîn hunermenda jin a Kurd bû ku di wê demê de li derveyî welêt sitraye û ahengên hunerî li dar xistine. Her wiha çand û hunera gelê xwe bi gelên din dane nasandin. Yekemîn car li welatê Libnanê bi hevaltiya hunermendên kurd Îsayê Berwarî û Mihemedê Arif aheng çêkirine. Di sala 1977-1978 de berê xwe dide welatên Ewrupayê û li gelek deverên wekî: Brîtanya, Nêmsa û Fransayê aheng û şahî li dar xistine."

Sitranên Gulbiharê:

Hunermenda me, Xatûna Sitrana Kurdî ya Nûjen e; ji ber ku wê sitranên xortaniyê hem bi ritma sivik û lez û hem bi montaja nûjen digotin.
Ji ber vê yekê sitranên wê cih di giyan û dilê Kurdan de girt, nemaze di dilê keç û kurên law û ciwan de; bi saya wan cih û navê xwe heta roja îroyîn girt.
Mijarên sitranên wê cûrbicûr in. Ji siruşta Kurdistanê, jin, xort, bêrîvan û gundiyan dest pê kiriye û heta bi dayîk û evîndaran.
Tişta ku hunermenda me cuda dike, ew diwîto ne yên ku bi çend hunermendên Kurd re gotine, mîna:
Zembîlfiroş bi Îsayê Berwarî re, Ez Keç im Keça Gundan im bi Semîrê Zaxoyî re û Xalxalokê bi Tehsînê Taha re… Hetanî niha jî hunermendên xort van sitranan dibêjin.

Li Ser Ezmûna Xwe di warê Hunerê de Dibêje:

"Bi rastî me gelek astengî dadiqurtandin heta ku me sitran û kasêtên xwe tomar dikirin. Mixabin, nifşên nû sitranên me dibêjin û nizanin ku ew sitran ên me ne; belê dibêjin ew ji folklor in".

Û dîsa dibêje:
"Divê ku hunermendên nû gotinên sitranên me neguhorin, weko me gotî bila ew bibêjin. Nimûne: Sitrana 'Ez Keç im Keça Gundan im', dikin 'Ez Keç im Keça Kurdan im'. Em dizanin me çi gotiye".
Hêjayî gotinê ye ku hunermenda Kurd "Fewziya Mihemed" xuşka wê ye.
Di sala 1985'ê de hunermenda dengzelal sitrana "Dilo Dilo Te Ez Hêlam" dibêje û êdî ji cîhana huner êbi dûr dikeve.
Hejmara sitranên wê zêdetir ji 270 sitranî ye û ew sitran, ji gotin û awazên helbestvan û hunermendên Kurd in.
Tevlî vî karê pîroz, Gulbiharê berxwedaneke civakî û ramyarî li hember rewiştên çewt ên civakê dikir.
Mixabin tevlî vê qas xebatê, ragihandin û dezgehên Kurdî tu guhdan pê nekir. Ji vê yekê min çend salan lêkolînên berfireh kirin heta ku min karîbû van agahiyan li serê bidim hev.
Pêwîst e dezgehên ragihandinê û nemaze kenalên peykî mafên wê lê vegerînin, baştir li ser wê û qonaxên jiyana wê ya hunerî biaxivin. Her wiha divê sitranên wê bi piranî biweşînin, da ku sitranên wê neyên jibîrkirin û ji nû ve zindî bibin.
Hunermenda hestnazik, di sala 2010'ê de bi ahîn û keserên xwe ve koça dawî dike û dengê wê, di dil û rewanê me de dimîne.

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

Çem – Dûr – Dar – Kund – Rûmet – Kendal – Behdînan – Keser – Şahî – çikûs – Kepez – Ba – Kak – Kerkûk – Xezal – Perwîn – Çû – Zozanî – Azad – Goristan
Peyva Windayî ji 7 tîpan pêk tê, ew jî navê bajarekî Başûrê Kurdistanê ye.

k	e	n	d	a	l	n	ç	e	m
g	o	r	i	s	t	a	n	ç	û
p	e	r	w	î	n	î	d	û	r
k	a	k	i	z	o	z	a	n	î
ç	i	k	û	s	x	e	z	a	l
k	e	r	k	û	k	q	d	a	r
r	û	m	e	t	n	a	z	a	d
k	u	n	d	x	k	e	p	e	z
b	e	h	d	î	n	a	n	b	a
ş	a	h	î	a	k	e	s	e	r

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	g	a	r	a	n	■	r	e	ş
2	o	r	m	a	n	■	o	■	o
3	v	î	n	■	■	■	t	o	p
4	e	n	w	e	r	■	■	l	■
5	n	■	e	m	■	d	■	d	a
6	d	d	a	■	d	e	r	a	d
7	■	r	■	m	a	m	■	r	a
8	z	e	■	e	z	■	p	■	r
9	û	m	e	y	a	■	p	ê	l